

## **Nameya Dr. med. Hesên Şetevî bo Rojan Hazim**

**Kake can,**

Min careke dî lînêrî û di çu guhorînên kitêbê da agehdarîya min nîne.

Eve hemû xetayên weşanxaneyê ne.

Spas

Hesên

Hadwin Shatavi <h.shatavi@gmail.com>

til: "anitosa@gmail.com" <anitosa@gmail.com>

dato: 24. feb. 2020 18.04

emne: name

sendt af: gmail.com

signeret af: gmail.com

sikkerhed: Standardkryptering (TLS) Få flere oplysninger

: Vigtigt ifølge Google-magi.

**Kak Rojanê ezîz,**

Di kitêbê da bi daxewe ev îştibane hene.

1. Navê min rast nedanane, "Dr." daxilî navê min e.
2. Resmê Mûsa Xanî yê li ser bergê kitêbê ne rast e. Mûsa Xan Zerza her ji binemale me nîne.
3. Navê te li ser kitêbê nîne û li daxil jî resmên min û te tê da nînin.
4. Paşê, li kitêbê destkarî kirine û pêştir bo min nehinartine.

Pêwîst bû li pêş çapê, bo lînêrînê cildekê bo min bihinêrin ku nehinartine.

Kake can, ez digel wan gelek axivtim bes fayde nebûye.

Evên ku min nivîsî tinê bo cenabê te ne. Te gelek zehmetî kêşaye.

Bo nivîsîna vê kitêbê dinyayek spasguzar im.

Silav û rêz.

Li jêr, min ew merhele bi tefsîl nivîsîne.

Min di pêşgotina xwe da jî gotîye û herweha di nameya bo cenabê te nivîsî da jî destnîşan kirîye ku keda te di vê pirtûkê da gelek mezin e. Te adeta ji nû ve bo min kitêb nivîsî, lewma careke dî dixwazim bêjim ku spasdar im, minetdar im. Amadekarîya cenabê te gelek bi dilê min bû û min jî ji dil dixwast ku qet destkarî lê neyê kirin û herwekî hatîye amade kirin çap bibe. Bes mixabin ku wekî te amadekirî çap nebûye.

Li vê derê dixwazim wan nuqteyên ku cidden ji teref weşanxaneyê Avestayê ve xeta û qusûrî hatîye kirin binivîsim.

1. Navê cenabê te wekî amadekar li ser berg û rûperê yêkemîn nehatîye bi cih kirin ku heqê te bû û lazim bû bête nivîsîn.

2. Ji pirtûkê rakirina fotografên te yên bi min ra û nameya ku min wekî spasdarî bo cenabê te nivîsî, gelek şaş e û ez vê yêkê wekî heqareta li xwe qebûl dikim. Karekî gelek naşirîn hatîye kirin û wekî nivîskarê pirtûkê vê teserrufa weşanxaneyê dûrî wijdan, ehlaq û edaletê dibînim û cidden rexne dikim.
3. Wekî cenabê te behs kirî, ji alîyê îmla û gramatîk ve jî, kêmasîya ji teref Weşanxaneya Avestayê ve hatîye kirin, wekî destwerdaneke di kitêbê da dibînim û vî karê weşanxaneyê jî neheq dibînim.
4. Navê min jî wekî Dr. Hesên Şetevî nenivîsîne ku ez vê jî şaş û neheq dibînim. Ne eyb e, ne şerm e, ez doktorê tîbbê me û li nav civatê wisa tême nas kirin. Lazim bû herwekî min nivîsî navê min li ser pirtûkê hatiba nivîsîn. Weşanxaneyê bêyî min navê min jî li goreyî xwe danaye ku xeletî kirine û herwisa dîzayna bergê pirtûkê jî ne bi dilê min e.
5. Li alîyê dî, wekî min di pêşgotina xwe da jî behs kirî, Kakşar Oremar, di veguhêzîya herfên [tîpên] aramî-erebî-farsî bo latînî da hevkarî kirîye û min jî spasî wî kirîye. Lê belê, di rûperê sêyemîn da, li bin navê min nivîsîna navê wî wekî "wergêrê ji farisî" yê kitêbê, ne rast e, şaş e. Çiku ev pirtûka RÊYA JÎYANÊ yêkser wergêra ji farisî nîne. Min tekstên xwe yên ji çapên berê yên soranî û farisî yên ku bo herfên latînî hatine veguhastin û wergêran, bo cenabê te rêkirin û te jî ji wan hemû tekstên cuda ev pirtûka kurmancî amade kir. Gelek mixabin ku navê cenabê te wekî amadekar hem li ser bergî, hem jî di rûperê pêşîn da nenivîsîne, tinê di rûperê duyemîn da nivîsîne.
6. Weşanxaneyê dikarî berî çapê ji min bipirse û mixabin ev kare nekirîye. Herwisa heke min zanîba ku ev şaşî û qusûre kirine min kitêb li nik wan nedida çap kirin. Di encam da; Weşanxaneya Avestayê pirtûka min bi dilê min û bi formata ku min daxwaz kirî çap nekirîye. Gelek aşkera li keda te, li xizmeta te neheqî hatîye kirin, bê edaletî û bê wijdanî hatîye kirin ku ez vê destwerdana weşanxaneyê ehlaqî, wijdanî û adil nabînim. Esasen di formata amadekarîya cenabê te da, navê min, yê Kakşar Oremar û navê te wekî amadekar di cihê xwe da hatibûn nivîsîn. Weşanxaneya Avestayê lazimbû riayetî wê amadekarîya ku me bo wan rêkirî kiriba. Ev hemû şaşîyên ji teref Weşanxaneya Avestayê ve hatine kirin cidden qabilî qebûl nînin. Mafê çapa duyemîn ya pirtûka min Rêya Jîyanê êdî nademe Weşanxaneya Avestayê û biryara çapa duyemîn em dê bi hev ra biden.

Ez careke dî lêborînê ji cenabê te dixwazim û divêt bête zanîn ku keda te dayî ji ya min zêdetir e û li nik min gelek meqbûl e, bihadar e

Digel rêz û silavên min yên germ.

Birayê te, Dr. Hesên Şetevî  
24 Sibat (february) 2020